



## Gerek hun çî bikin da ku miaşê xwe bistînin

Piraniya kesên ku li kar digerin peywir û çalakiyên ku divê ew bikin hene da ku miaşê xwe yê piştgiriya bistînin. Hin mînakên van miaşan wek JobSeeker Payment, Youth Allowance for job seekers, Special Benefit – nominated visa holders yan Parenting Payment Single bi mutual obligation requirements.

Ji bo ku hun bi berdewamî miasê piştgiriya xwe bistînin, divê hun hemû tiştên jêrîn bikin:

- Hemû hewcedariyên di nav Job Plan xwe de bicîh bînin.
- Miaşê xwe ji Centrelink re her 2 heftan ragehînin, heta ku 0 dolar be jî.
- Ji me re bibêjin dema ku rewşa we hatiye guhartin, wekî têkiliya we, miaş an navnîşana we.

Em ji van re dibêjin mutual obligation requirements (pêdiviyên berpirsyariya hevbeş). Ev peywir û çalakî ne ku hun qebûl dikin dema ku hun ji me pereyan distînin. Ev ji hêla Centrelink an jî ji hêla peydakerê karûbarên we yên kar ve tê birêvebirin, dibe ku yek ji yên jêrîn be:

- Workforce Australia
- Inclusive Employment Australia
- Remote Australia Employment Service

Wekî beşek ji mutual obligation requirements, divê hun Job Plan qebûl bikin. Gava ku we Job Plan hebe û hun nikarin biçin randevûyê an şertên berpirsyariya hevpar pêk bînin, divê hun pêşî bi dabînkerekê xwe re têkiliyê daynin. Heger ji hêla Centrelink ve tê birêvebirin, hun dikarin li ser xeta miaş ya herdem telefonî me bikin.

Ger hun neçin randevûyan an jî berpirsyariya xwe pêk neynin, dibe ku miaşê we raweste û dibe ku ceza li we keve. Ger ev tişt çê bibe, divê hun bi peydakerê xwe an jî bi Centrelink re biaxivin.

Eger we dabînkerekê xizmetên kar yên Workforce Australia hebe, divê hun her meh hejmarek diyarkirî ya xalan bistînin. Divê hun vê bikin ji bo ku hun mutual obligation requirements bicîh bînin. Dema ku hun pêdiviyên berpirsyariya hevbeş wekî serlêdana ji bo kar, çûna randevûyan an perwerdehiyê temam dikin, hun xalan digirin.

Heger hun her meh negihîjin hejmara xalên ku we hewce ye, dibe ku miaşê we raweste. Ji kerema xwe heger ev yek biqewime, telefonî dabînkerekê xizmetên kar ên Workforce Australia bikin.

Heger hun Workforce Australia Online bikar tînin, hun dikarin bi Digital Services Contact Centre re li ser **1800 314 677** telefon bikin. Hun dikarin daxwaz bikin ku bi kesekî/ê ku bi zimanê we diaxive re biaxivin.

Eger hun di Remote Australia Employment Service de ne, ne hewce ye ku her meh hejmareke xalan bi dest bixin.

Hun dikarin agahdariyên bêtir li ser ver bibinin:

- [servicesaustralia.gov.au](https://servicesaustralia.gov.au), û
- [workforceaustralia.gov.au](https://workforceaustralia.gov.au)

Ji bo agahdariyê bi zimanê xwe hun dikarin telefonî me bikin li ser **131 202** an jî biçin [servicesaustralia.gov.au/kurdish-kurmanji](https://servicesaustralia.gov.au/kurdish-kurmanji)



# What you need to do to keep getting your payment

Most job seekers have tasks and activities they must do to get their income support payment. Some examples of these payments are JobSeeker Payment, Youth Allowance for job seekers, Special Benefit – nominated visa holders or Parenting Payment Single with mutual obligation requirements.

To keep getting your income support payment you need to do all of the following:

- Meet all the requirements in your Job Plan.
- Report your income to Centrelink every 2 weeks, even if it is 0 dollars.
- Tell us when your circumstances change, like your relationship, income or address.

We call these mutual obligation requirements. These are tasks and activities you agree to do while you get a payment from us. This is managed by Centrelink or by your employment services provider, which could be one of the following:

- Workforce Australia
- Inclusive Employment Australia
- Remote Australia Employment Service

As part of your mutual obligation requirements, you must agree to a Job Plan. When you have a Job Plan and cannot go to an appointment or meet your requirements, you need to contact your provider ahead of time. If managed by Centrelink, you can call us on your regular payment line.

If you do not go to appointments or meet your requirements, your payment may stop and you may get a penalty. If this happens you must talk to your provider or Centrelink.

If you have a Workforce Australia employment services provider, you must get a certain number of points each month. You need to do this to meet your mutual obligation requirements. You get points when you complete requirements like applying for jobs, going to appointments or training.

If you do not reach the number of points you need each month, your payment may stop. Please call your Workforce Australia employment services provider if this happens.

If you are with Workforce Australia Online, you can call the Digital Services Contact Centre on **1800 314 677**. You can ask to speak to someone in your language.

You do not need to achieve a certain number of points each month if you are in the Remote Australia Employment Service.

You can find more information at:

- **[servicesaustralia.gov.au](https://servicesaustralia.gov.au)**, and
- **[workforceaustralia.gov.au](https://workforceaustralia.gov.au)**

For information in your language you can call us on **131 202** or go to **[servicesaustralia.gov.au/your language](https://servicesaustralia.gov.au/your language)**